HAWAR a nû

Hizrî - Ramyarî - Rewşenbîrî

Kombenda Kawa Bo Çanda Kurdî Derdixe

Çavdêrê Gişti

Selah Bedredîn

Desteka Nivîskara

Dr. Birahm Mehmûd
Ebdilxaliq Sersam
Vedan Adem

Şîretkarên Nivîskara

Dr. Mihemed Ezîz Zaza
Ferde Cemîl Paşa
Foad Gemo

Derhênana Hunerî

Îsam Hecî Tahir

Çapa Eliktronî

N. Zaza

Naverok

Gotara serok Barzanî Bi helkefta helbijartina wî bo serokatiya Kurdistanê		146
Bidiwadeçûn a pirsa revandin û şehîdbûna Şêx xeznewî	Selah Bedireldîn	136
Nirxandinek Giştî Li Ser Rewşa Kurdên Roja vayê Kurdistanê (Sûriyê)	Demhat Hezexî	129
Netewe	Osman Karavil	119
DEWLETA EL- MIXABERAT DEST PÊ KIRIYE GORA XWE DIKOLE	FÛWAD SÎPAN	116
Bi Taybetî Çima Şêx Meşûq El-Xeznewî...!?	Ferha Yûsif	114
Gotara berêz Selah bediredîn Li heftîya rewşenbîrîya netewîy	Selah Bedireldîn	112

Çewaniya Firotina Kovara Hawar nû :
Pişkdarî jibo yek sal:
Dezgehên Hukmetê û mîrî û Sendîke (12000) Dînar
Kesan (10000) Dînar
Pişkdarî jibo Şeş Heyv:
Dezgehên Hukmetê û mîrî û Sendîke (6000) Dînar
Kesan (5000) Dînar
Jibo bêtir pêzanîn peywendiyê Bi Kombenda Kawa bo Çanda Kurdî bike

Hewlêr - Şoreş - Cada Selahedîn Tel : 2240441 - 2242843

binkeykawa@hevgirtin.net www.hevgirtin.net

Ji dêla sergotarê

Gotara serok Barzanî Bi helkefta helbijartina wî bo serokatiya Kurdistanê

Bi navê xwedayê mezin û dilovan

Birayê berêz cenabê Mam Celal serikomarê îraqa fediral

Birayê berêz cêgirên serikomarî

Birayê berêz di. Haçim alhesenî, se rok ê perlemanê îraqa fediral

Birayan, xuşkan

Serikirde û nûyinerên hizbên hevpeyman

Berêz balyozên welatên dost

Birayê berêz serokê perlemanê Kurdistanê

Xuşik û birayan, endamên perlemanê Kurdistanê

Amadebûyên berêz

Silav li we bin û bi xêrihatina hemî layekî dikim jibo amadebûn û pişkdarîya we divê helkeftêda.

Xweşhalîyeka mezine bo min ku wek pêşimergeyek ji layê xelkê milletê min ve bi rê ya perlemanê helbijartyê xwe ez raspardîm bo wergirtina vî erkî û hilgirtina vê berpirsîyaryê, ez vê ferman û teklîfa gelê Kurdistanê bi xelat û padaşt dizanim bo hemî pêşimerge û xebatkerîn gelê me.

Li wê rujê berî 34 sala ku bo cara îkem min çekê pêşimergayetyê bi milê xweve kirî heya îru gelek evirazî û nişîvêyin şoreşa Kurdistanê û gelek jîyana tehil û şor û kulemergî ya gelê xwe min dît. Lê rujekê jî min guman nebo ku ev millete her dê bi serikevêt. Ez xweşhalim ku evro ez digel we deme û berihemê wê

renc û xebata bê rawesitîyana we bi çav dibînim. Ewa ku min gelek xembar dikit û gîyanê min azar didit eweye, gelek ji dost û heval û pêşimergeêyin ku pêk ve bûn û germî û sermayan pişkdarbûyin, divî karwanê pir serwerîde gîyanê xwe ji dest dayine û şehîd bûyine. Cihê daxê ye wan ev roje nedît, ez dilnîyame ku evro gîyanê wan li hindavî serê me difirê, ew bi tenê leşê wan nemaye, lê gîyanê wan hemîdema ligel mede ye û divê şadî û xweşyê de pişkdarîya me dikin, dilnîyame ku gîyanê serikirdên me yên nemir evro bi van serkeftinan dişadin.

Ev perlemanê hatî ye danan ku cihê bawerî û rêzigirtina me hemî layane û nîşana xwast û vîyana rewaya milletê me ye, ev damezira wê yasayê bi dengê wan hatî ye û dê hilgirê rengê wan bê, eve berihemê xwîna şehîdane û xebata pêşimergey û qurbanîya enfal û kîmîyabaranane. Derencamê êk rêzî û êk helwîsitîya milletê me ye, nemaze herdo partên xebatker yekîtî nîştmanî Kurdistan û partî dîmukiratî Kurdistan.

Niha li vêre germtirîn silava arastey sercem gelê Kurdistanê bi gişti dikim çi li ser axa Kurdistanê bin yan jî li mişextyê. Bi taybet silavên germ arastey pêşimergê Kurdistanê dikim ku ser bi çi layekî sîyasî bin ku parêzivanê şerefa milletê kurd bû, û kurên rojên dijwar û sext bû. Her dîsan silavan arastey endam û dost û hevalên partî û yekîtî û sercem layenên din dikim, ev destkeftê ku evro bidestive hatî berihemê xebat û berxwedana hemîyane bê cêwazî, divê hûn hemî jî pişkdarîya parastin û berev pêşvebirina vê destkeftê bikin û ez dibêjme we hemûyan: Hûn birayên min yên xweştivî ne, bila em hemî li xwe binêrin û laperekî nû vekin, ku laperê birayetî û tebayê û yekbûnê bê, ewa çû êdî nazivirê û her birîneke didilde mayî çare bikin û diser hemî girên derunî de derbaz bibin û bi serikevin, pêdivî ji evro û pêve çavpûşyê li kêm û kasyên duhî bikin, carek e din lê nezivirin, divê berev bilindahîya serkeftinê û asoyekê geşitir bi rê bikevin, divê ji evro wêve berev bihêzkirina hizra netewayetî û perepêdana gîyanê dîmukirasyê di

civaka Kurdistanêde pênigava pavêjin, divê em xwe ji hizbayetîya berteng û milmlanê ya bê encam dûr bêxin û helsokewta wan roja dûbare nekin ku birîna milletê me êş û azardidin.

Em wek kurd milletekî serbilindîn ku xebata me hîç rujekê nerawesitîyaye û çi karesatekê jî em wesitîyay û dilsar nekirîne.

Li roja destpêka şoreşa eylunê armanc û durşmên me di ron û aşikire bûn, ew jî dîmokirasî bo îêraqê û otonomî bo Kurdistan, ev durşmê zindî nîşana zanabûn û dûrbînî û helsengandina ke tiwarîya serikirdayetîya şoreşa kurdî bo. Sebaret barûdûxê xebata me û rewşa îêraqê û deverê, evro jî ku ev durşme bûye îraqa fediral û dîmokirasî, jêderê wê bîrikirinê û helsengandina ketiwarîyane ye, jiber wê pirsa mafên milletê kurd, pirsa dîmokirasyê li îêraqê, du pirsên girêday hevin û na êne cudakirin.

Rijêmên yek li dûv yek gelek bizav kirin şerê dasepênayê xwe bi ser kurda û bergirî û berxwedana me bikene milmlane û şerê dinêvbera du neteweyin kurd û ereb. Jiber wê çendê ku armancên wan çepel û gilaw bûn çi jê şîn nebû, berovajî gelek ji xebatkerên ereb hev xebat û hevsengerên mebûn divê bizava dîmukirasî û divî karwanê xebatê de, ewan jî li tenişta me qurbanî û zehmeteka zor pêşkêş kir û gelekan jî gîyanê xwe pêşkêşikir, evrojî her li gel wan heval û xebatkeran her dwî karwanê xebatîde berdewamin, heker duhî di çeperê dijî dikitatorîyetê de pêk ve bûn, eve evro jî di gorepana karkirin jibo bi destive anîna fediralîzmê û dîmukirasyê em pêk vene, di îraqa dahatî jî de hîç pêlan û nexşeyek bo keleberxistine navbera vî gelê çewisawe de serinagirê û ew birayetîya bi erik û mandîbûn me parastî, divê bibê berê binîyata paşerojeke geş bo me.

Evro li seranserê îêraqê şûnwarên karesat û dirindayetî ya rijêma behs û rijêmên berî wan. Ew jî dîyar û berçavin, li goristanên bi kom îskekan pêk ve nîjirawin. Eve derfeteke zêrîne jibo ku mifayê ji xeletî û hewlên bê encamên wan rijêman werbigirin bo paşerojeka geş li ser binemayê birayetî û

yeksanyê divî welatîde ava bikin û hizir li tiştên din nehêtekirin. Gelê îêraqê bi hemî reng û regezanive toşî şerê birîn û cînusaydî bûye, evro demê hindê ye ku birînên vî gelî bihêne derman kirin û welat bê avedankirin. Welatekî ku mafê mirovî têda parastî bê.

Em wek kurd şanazyê bi wê çendê dikin ku bi dirêjîya mêjûya şoreşa me li Kurdistana îêraqê rojekê ji rojan me pena bo tîrurê nebirî ye û me bîr li hindê jî nekirî ye, herçend e rijêma îêraqê li destpêka şoreşa eylûnê bi tîrurê beramberî me destpêkir û heya dawiyê jî dest jê nekêşa û her dirêjî pêda heya gehandî ye diranidayetîtirîn şêwazê tîrurê, ewbû mezintirîn karê diranidayetyê wek efalên sala 1988 û enfala feyilîyan û enfala Barzanîyan û kîmîya baran û tawana mezina helebçe encam dayî, noke jî wextê hindê ye li ser bingehê fediralîzim û dîmukirasî û ferelayenî îraqa nû dirust bibê. Ku têda yasa serwer bê, divê îraqa nû li ser bingehê pêk ve jîyana arezûmendaneya herdu netewyên serekî kurd û ereb dabimezirê û hemî welatyên îêraqê ku ser bi her regez û ayin û mezheb û tayfekê ve bê, hest bikê ku ev welate welatê wî ye û erik û mafên wî dîyarbin.

Me gelek qurbanî dane bo bidestive anîna vê armancê û heya dawiyê jî dê her xebatê kin, divê divî welatîde tenahî û asayiş hebê û serûmal û rûmeta xelkî parastî bê, divê îraq cihê xweyê hejî di kor û komelgeha nêv dewletî û herêmaêetî de werbigirê. Em dê bi hemî şîyanan piştgêrîya wê kin jibo bidestive anîna vê paşerojê û her hukmeteke pêgîr bê bi vê rêbazê em dê piştevanîya wê kin û dê digelida bin.

Li rojên bihên, hukmeta nû ya herêma Kurdistanê dê pêkihêt û dê baweriyê ji perlemanî wergirt. Ev hukmeta nû, dê hukmeteka yekgirtî bê û li ser bingehekê berfireh û erikên wê gelek di alozin. Jiber hindê divê hemî layek hevkar bin bo serkeftina vê hukmetê di karûbar û bernamên wêde, divê jêrxana Kurdistanê ser ji nûve bê avakirin, ew jêrxana ku rijêma îêraqê ji hemî layan ve kavil û wêran kirî, divê Kurdistan geşe bikê

bi rêk û pirên pêşkeftî, herwesan divê puste û gehandina serdemane li Kurdistanê bêne damezirandin, xizmetguzaryên av û hêza karebê bigehine hemî deveran û ew kêm û kasyên jivî layêve hene bi zûtirîn dem çareser bibin, û divê qutabxane û bingehên tendirusitî li hemî cih û deverên dûr û nêzîk bêne danan, pêdivî ye başţirîn sîstemê tendirusitî li Kurdistanê bikevê karî, divê sîstemê perwerdê bêdirustkirin û pak kirin ji şûnwarên behsîya. Perwerde bingehê hemî karên dî ye û dahatyê me ye, behsî gelek xebitîne jibo şêlandina jêrxane û bîrikirina eqlîyeta civaka me. Divê bi zûtirîn dem van asewar û genidelî yên nemirovane paqij bikin, zanku û peymangeh û xwendina bilind bi gişţî divê bayexeka mezin pê bêdan, pêdivî ye zankwyên Kurdistanê kêmtir nebin ji zankwyên deverê, divê bibine melbendê ţîşkdana şarstanîyetê û dîmokirasyê û rolê wan di civaka Kurdistanê de karîger û berçav bê.

Herwesan divê peywendî û têkelîyeka berfireh digel zanku û damezrawîn zanistyên cîhanî damezirînin, divê çaksazî di dam û dezgehande bê kirin û hemî corên genidelyê bihêne binibirikirin, divê dadiperwerî û yeksanî di xizmetgozarîyanda daxwaz û xwastên xelkê bi pişt guhive neênehavêtin û pêdivyên wan bi zûtirîn dem bicih bênin, divê bernamekî rêkûpêk û têr û tijî bê danan bo geşekirina aborê herêma Kurdistanê û bizav û çalakyên bazirganî, pêdivî ye delîva karî zor bibê û nabê xelkê bê kar divî welatê dewlemenda bimînê, gelekî xweşguzeran û xweşîjî dişê paşerojeka geş bo xwe danê, pêdivî ye milletê me, milletekî berihemdar bê, nek milletekî bekarihên û mişexur bê.

Mirovê kurd kesekî çalake û bi hêz û zendkan û bi hêza bîrikirina xwe bijê, bo vê meremê jî divê kargeh û fabirîke li hemî cihên Kurdistanê bihêne damezirandin û pûyte bi berihemê pîşesazî bihêdan, dîsan pûyte bi keritê çandinê û keritê geşitûguzar bihêdan û bibin du boarên zêndî yên aborê geşepêdayê welatê me, divê aborê Kurdistanê li ser

bingehê bazarê azad bihê danan û pûyte bi keritê taybet û pirojên hevpişk bihêdan û hukmet hemî curên harîkarîyan bidê û asankarî û pişteyanîya wan misoger bikê.

Li Kurdistanê rêz li azadyê dihê girtin, çi azadîya kesokî yan jî azadîya komele û girûpan. Hemî li dûv yasayê û rênimayên wê dê parastî û rêz lê girtîbin, dê rêz li bîr û boçunên xelkê êyegirtin, bawerîya aênî azade, herwesan hêvîdarim em bişyên bi hêztirên bawerî û mitmane dinavbera gel û hukmeta herîmê de dirust bikin, ew bawerî û mitmane ye serkeftin û pîşkeftina herdu layan misuger diket.

Divê pûyteke temam bi qutabîyan û lawan bihêdan û pirojên pêdivî bo bihêne bicih ênan û rêz li arezû û xwastên wan bihê girtin. Herwesan divê derfeta karê ji hejî û guncayê bo lawan peyda bibê.

Afiret rulê xweyê hejî dinav civakîde bigêrin, û çi cêwazîyek e yasayê divî boarîde nemînê, divê jin bixwe jî xebatê bikin bo guhorêna rewşa xwe di civakîde û em jî ji hemî layekîve dê pişteyanîya wan kin dê rêz li aênê pîruzê îslamê û dab û nerîtên netewayetî ê girtin. Herwesan dê rêz li kesayetyên aynî û hemî kesayetyên civakî ê girtin, ku her kesekê bivê li cihê xwe xizmeta civaka kurdewarî û vê rewşa nû bikê û rolê xwe têde bibînê.

Li vêre ez dûpat dikim ku rêz dê li azadîya karî û azadîya çalakyên sîyasî yên hizib û layenên Kurdistanê ê girtin, boçun û pêşinîyazên wan dê liberçav hêne wergirtin.

Herwesan li Kurdistanê ragehandin bi hemî şêwazan azade û sansor li ser nîne.

Li herêma Kurdistanê cêwazîya neteweyê nîne, hemî welatî ser bi çi netewe û aynek bin erik û mafên wan wek hevin, turikman û kilduwaşor birayên berêzên mene, her çi di şîyande û desthelata me de heye, li pênavê bextewerîya wan dê kin, em hemî li ser vê axê bi hevre û pêk ve dijên, çarenivîs û xweşî û nexweşyên me yekin, em dê dakokyê û bergiryê ji mafên wan kin, hemî ayin û mezhebên cuda cuda li Kurdistanê dê rêz lê ê girtin, aynan azadîya xwe ya temam heye û bi çavekî em li

hemîyan dinêrên, birayên meyên êzdî kurdên resenin, û bê texsîrî pişkdarî di xebata xweya neteweyîda kirî ye, û cihê xwe dinav dilê milletê kurd de kirî ye, mezintirîn pile û rêz hene bo ewan, birayên meyên feyilî di xebata dirêja milletê xweda, mezintirîn zebir û zîyan jilayê rijîma behs bi beriketî ye, û êş û azareka bê wêne dîtî ye, divên bi baştirîn şêwe bo ewan bê qerebokirin û rolê xwe dinav civakîde bigêrin, evro ku xebata netewîy ya wan hatî ye berihem hênan, divê ew jî mafên xwe behredar bin û dilnîya bin.

Kes û karên qurbanyên enfala û germîyan û qeredax û behdînan û deşta koye û Barzanyên enfalkirî û feyilî û karesatên kîmîya barana helebçe û ragiwastin û derbederan, hemî cihê rêz û teqdîrê ne û pêdivî ye asewara van karesatan li jîyana wan bisirênewe û harîkarîya wan bê kirin.

Gelek zerer û zîyan bi awaran kefitî ye, û qurbanyên bê wênedayne, çi ewên awareyê welatên hevsoy boyin di demê lê qewmî û karesatanda, çi ewên sîyaseta dirindane û zebir û zenga rijêmê dinav Kurdistanêde awerikirîn, hemî cihê rêzigirtina mene, ewên neşîyayin vegerine ser gund û cihên bav û kalikên xwe divê asankarî û harîkarîyan bidine wan.

Divê bernamekê têr û tesel bê danan bo avedankirina gundên Kurdistanê û gehandina xizmetgozaryên pêdivî bo wan û geşekirina aborê wan, rijêma îêraqê bi wê hêvyê ku zîyaneka mezin û karîger li aborê Kurdistanê û bizava me bidê, bi hizaran gund digel axê rastkirin û xelkê wan aware kir, jiber hindê ku ev gundên he mal û lendên pîşmergê şoreşa me bûn.

Pîşmergên Kurdistanê, hûn ezîztirîn kes û karên mene, pîşmerge, xebatkerên rojên sext û dijwar û rojên man û nemanê, ez jî pîşmergeme wek we, û ez şanazyê dikim ku ez li rêza we me, hûn li bilindtirîn cihin dinav dil û deronê milletê xwede, û dinav malên şehîdande, noke jî ku milletê kurd yê parastî ye, her li jêr sîbera hişîyarî û mêrxasîya we ye, hûn bi birîyara milletê xwe û ji encamê şehîdan

dirust bûne, heya gelê Kurdistanê mabê hûn jî dê mînin. Rujekê we berevanî ji bûn û mana milletê kurd dikir û bi xwîna xwe we dîrok dinivîsî, nokejî hûn her ew kurên caranin û nav û pile û paya we her wek xwe ye, bênê erikên we hatîne guhorên, berê we xebat dikir bo jinavbirina rijêma dikitator û bi destiveanîna fediralî û dîmokirasyê, evro hûn xebatê dikin bo parastina van destkeftan û bo dabînkirina tenahî û asayşê li îêraqê û Kurdistanê.

Divî serdemîde, tîror mezintirîn metirsî ye li ser jîyana dîmokirasyê û pîşkeftinê, em li beramber tîrorê nadanên û demjmêrekê jî em xilmaş nabin, tîrorstan çi paşerojek nîne, divî welatîde divê zû berihingarî wan bibin û ji reh û rîşalan hilkêşên, lê karê jinavbirina tîrorê ne bênê karê dezgehekê yan damezrawekê ye, divê hemî welatî hemî part bi hevre hevkar bin û piştevanîya dam û dezgehên asayşê biken.

Kerkûkê rêka çareserikirina rasteqîneya wê bo hatî ye destnîşankirin, ewjî ew e ku di yasaya berwexta rêvebirina dewletîde hatî, em bi çareserîyeka cuda jivê çareseryê razî nabin, hemî layekî liser vê rêkeftinê îmza kirî ye û ya bûye yasa û distûr, pêdivî ye bê gîrobûn bê bicih înan û berga (58) meseleyeka cidî ye û bi çi şêwekî paşekîşî jivê meselê naê qebûl kirin, û deverên dabirayên din jî, her bi vî şêweyê divê bo ser herêma Kurdistanê bihêne vegerandin, jiber hindê ku eve axa Kurdistanê ye û jê naê cudakirin, ewa ku di yasaya berwexta rêvebirina dewletêde hatî, layenê herî kême ji mafên milletê kurd, ne mumkne em bi tiştekî kêmtir jivan mafan razî bibin, ewên ku di yasaya navibirîde hatine dîyarikirin, divê ew maf wek xwe biçine dinav distûrê hemîşeyê îraqîde.

Distûr pênigaveka mezine û pêdivî ye hemî çên û texe di dariştina wîde pişkdar bin, distûr divê bi rêkeftin û tewafiq (li hev hatin) bê, bo hindê nasnama îraqa federal û dîmokiratî pêve daêrbê.

Em rêzê li sercem welatên hevsoy digirên û destê dostayetyê bo wan dirêj dikin, herwesa em kar dikin bo hindê baştirîn peywendî û

rêz li hevsogirtin û dustayetyê damezirînên, eve delîve û derfeteke baş e û em daxwazê jiwan dikin ewjî harîkar bin bo îêraqê û bo herêma Kurdistanê, em mayê xwe di karûbarên navixwyê wan nakin û hêvîdarin ew jî mayê xwe di karûbarên navixwyên me nekin, em spasîya wan hevsoya dikin ewên li demê karesat û rûdanan de milletê me hembêz kirin û destê harîkaryê bo dirêjikirin.

Derbarey netewê kurd, ku liser welatên hevsoyda hatî ye dabeşkirin, em birayên xwe dilnîya dikin ku dil û derûnê me digel wane û digel êş û azarên wane, em hêvîdarin penahê bo şîwazên serdemî bibin jibo daxwazîya mafên xwe, evro bayê zebir û zengê nemaye, eve bo kurdan bênê zîyan û malwêranî di dûvireye, her bi wî şîweyê, hêvîdarin ew welat jî guhê xwe bidine daxwazyên birayên me û dan û standinan ligel bikin.

Hêvîdarim ew bawerî û mitmaneya daye min bibê havênê yekirêzî û yek helwêsitîya milletê me, rastyê bo we bêjim bo min pîşmergayetî ji hemî paye û pilekê giringtir û pêrozitir e, lê evro em mijûlî danana dam û dezgehane-serokê herîmê jî dezgeyekî dî ye li Kurdistanê-şanazîyek e mezine, divê rolekî mutewazih bo xizmeta we bigêrim.

Bêgoman divê em zor bi cidî berev damezirandina dam û dezgehên distûrî û yasayê biçên û eve ji karên meyên berahyê bin, digel berçav wergirtina erikên kumelayetî û şureşgêrî jilayekî, û pêdivî damezirandina rêvebirineke hevçerx û yasayê û distûrî jilayekî dîve bê. Ez bixwe li qutabxanekê hatîme fêrikirin û perwerdekirin ku demê min çavên xwe vekirin ez wesan têgehiştîme ku berxwedan rê ya yekane ye bo jîyanê, herdemê min zincîrek dîbê, zincîra girêdana dest û pên xebatkerekî hatî ye bîra min, her demê min kinfek dêbê qinara qehremanekî sîdaredayê hatî ye bîra min, her rûbarek min dîbê, rûbarê aras hatî ye bîra min ku pîşmergehê Kurdistanê xwe havêtyê, ew roja ez bûme pîşmerge û lidûv Barzanyê nemir min çek helgirtî, ez wesan dizanim hingê mezintirîn şanazî bû

behra min û nuke jî ku ez vî pusitî werdigirim bo hindê xizmeta we bikim, evejî bo min her dirêjepêdana pîşmergayetyê ye, heke ne jibo xizmeta we bê min çi mebestên dî nînin.

Divan rojandedê dest bi yekgirtina hukmeta herêma Kurdistanê ê kirin, hindek caran jiber li hev guhorêna bîr û baweran kar dereng dihêne encamdan, eve siroştê jîyana dîmokirasyê ye, nehez xewnan dibînin ew hizir dikin yekgirtin dê gîro bê, êdî em di yekgirtî û jihev razîne, bila pişt rast bin, ew xewnên wan careka din bicih nahên, bome qayîlbûn û bawerîya milletê me giring e, dilnîya jî bin ku hemî tişt bi şîret û guhorîna boçûnan digel birayê min yê hêja cenabê Mam Celal dê bicih ê, wesan nîne ku ew li bexda û ez li vêre û me ageh ji hevdû nîne, berovajî em bê hevdû çi pênigavan na avêjin, her dîsan serikirdayetîya herdu partan jî divê nêzîkî hevbin û hemahengî ligel partên din jî hebê û divê em nehêlin careka din destên çepel bikevne dinavide û mala kurdan têk bidin.

Em wek milletê kurd spasîya serokê emirîka (corc boş) û gelê emirîka dikin ku digel milletê me de bûn jibo ruxandin û rizgarbûn ji dirindayetirîn rijêma dikitatorî, em çi caran vê birîyara wêrek ya wan jibîr nakin, dûpat dikin dê beramberî tîrorê jî her pêk ve û bihevre bin bo dirustkirina îraqeka federal û dîmokirasî.

Herwesan spasîya serok wezîrên birîtanîya berêz (tonî bilêr) û gelê birîtanîya û spasîya welatên hevpeyman dikin.

Li vêre min divê spasîyek e germ arastey xelkê xebatkerê hewlêrê jî bikim hewlêra dêrên û dikitator bezîn, hewlêr berdewame li ser qurbanîdan û hedarek e zor jî heye, diser hindêre ku zor caran jî pêtivyên kardestên îmnahyê û rîgirtin dibine serbarê girftarî û zehmetê bo wan, ez spasîya wan dikim û daxwaza lêborînê jê dikim.

Li dawiyê germtirîn silav bo gîyanê paqijê şehîdên rêya rizgarî û azadîya îraq û Kurdistanê.

Bijî îraqa federal û dîmukirasî.

Bijî birayetî kurd û ereb û turikman û kilduwaşûrî.

Bidiwadeçûn a pirsa revandin û şehîdbûna Şêx xeznewî

Selah Bederdîn

Tanî nivîsandina vê nivîsarê jî, hîn ronakbîrê kurd Şêx Maşûq Xeznewî di hejmara " windabûyan " de bû. Li gor agehdariyên Malbata wî û rêxistinên mafê mirovan û hin dost û xêrxwazên wî, ew ji 10 gulana îsal ve ji aliyê organên parastinê ve hatibû revandin!

Bêgoman xistina vê tawanbariya kirêt ser şane organên parastinê (Muxaberat) ne ji ber xwe ve hatiye (tevî, ku hîn isbat nebûye, û organê desthelatê ti informasyon derbarê vê yekê de nadin), ew destnîşankirin li ser bingeha çend tiştan hatiye:

1- weke hatiye naskirin, organên qirkirinê li welatê me, kesên opozîsyon direvênin û wan winda dikin, li gor biryarên rêjîma desthelatdar û zakonên awarte, ên tanî niha li Sûriyê bi kar tên. û bi sedan, yan jî bi hezaran bûyerên girtin û revandinê ru didin, ji ber ew bi pilan û dizî pêk tênin; ji ber wê carna bi dehê salan derbas dibin, û ji nû ve xwediyê girtiyan dizanin, ku kesekî wan hîn di filan zindanê de, yan di a din de (ji ber pirbûna wan) sax maye! Û nemûna girtiyên Libnanê, ku ji mêj ve windabûyî ne vî tiştî isbat dike.

2- Bi hoyê tevlîhevî û serlêgerîna , ku eva çend mehin ketiye nav organên desthelatê de, nemaze piştî derxistna organên parastina wê ji Libnanê, û piştî, ku desttêwerdana wê a qirêj di hundirê Iraqê de, û derxistina belgename ji aliyê leşkerên fireregez û hêzên parastina Iraqê ve, ku eşkira piştgiriya têrorê dike, her weha piştî, ku hin tevgerên opozîsyona sûrî serî hildane; bi hoyê van hemû tiştan û ji ber ku organên parastinê ketiye rojên xwe ên dawî; dest bi revandina xelkê

dikin, wek nîşana rewşa histêrî û dijberiya di navbera baskên cihê de ên rêjîmê; ji bilî revandina şêx xeznewî, zaniyarê îraqî ê dîmoqrat, dekotor Şakir Al-Dicêlî jî, ê ku di rêya sûrî de xwestibû were welatê xwe, bê şop windakirin.

3- Tevî, ku guhertinên li ser sewiya welat, navçe û cîhanê de çê dibin û ne di berjewendiya hebûna rêjîmê dene jî, lê ew li serê xwe siwar bûne û berdewamin li ser bindestiya civaka sûrî bi giştî û a kurdî bi taybetî. Serokatiya rêjîm berdewame di hewildanên xwe de jibo bi hêzkirina peywendiyên malbatî û e'şîretî di nav kurdan de, da ku tevgera siyasî a kurdî, a ku hêviyên gel li ser hene, lawaz bike, û herweha xwe ji kesayetiyên zana û xwedî rol di civakê de xelas bike, wek şêx xeznewî, ê ku dihate hejmartin weke ronakbîrekî netewyî, misilman û dêmoqrat û dij bi islamiya siyasî û têrorê.

4- Pêwiste bê gotin, ku windakirina şêx Xeznewî ji aliyê destheladarên sûriyê ve ji meydana Sûriyê weke zaniyarekî olî û serbixwe, û ji meydana kurdî weke ronakbîrekî neteweyî dêmoqrat, li ser nerîn, raport û pêşniyazên lîwaa Mihemed Mensûra hatibû; ev mirovê berpirsê ewlekariyê ê pirsa kurdî ye û serokê organa parastina siyasî ye û timî jî daxwazkarê bi hêzkirina peywendiyên e'şîtî bû di nav kurdan de û qirkirina (windakirina) welatparêzên kurd bû li hemû cihê ku lê dijîn (nêzîkî 30 salî li Cezîrê – di nav kurdan de- bi serkevtin bi wî erkê xwe rabû, nexasime ji hevxistina tevgera kurdî, sazkirina rêxistinên nû û perwerdekirina wan û serkêşên wan bi kultura jihev ne hezkirinê û parçe parçekirinê, da ku rê li pêşiya serkevtina tevgera kurdî û mirovên zana, ên weke şêx Xeznewî, ku îro tevger bi hewceyî wan, bigrin.

Piraniya girupên siyasî ên kurdî, rewşenbîrên kurd û ereb li sûriyê û rêxistinên mafê mirov revandin û wendakirina şêx reswe kirin û piştgiriya xwe jê re eşkira kirin; ji bo bi cihanîna vê helwêsta niştimanî,dêmoqratî û mirovayetî di praktîkê de, ez pêşniyaz dikim û ji hemûyan daxwaz dikim, ku bi meşên (demonstrasyon) aştî rabin û komîteke amadeyî niştimanî bo serperiştiya wan meşan bikê, û diruşmên sereke bo serbestkirina şêx Xweznewî, rakirina zakon û rewşa awarte, pêkanîna helbijartinên dêmoqratî, azadiya mafên giştî, hilweşandina organên parastinê û

dadgehkirina serokên wan organan û pejirandina gelê kurd û mafên wan; her weha ez pêşniyaz dikim, ku ev meş ji Qamişlo, Kobanê û Efrînê destpêbikin û berdewam be, tanî bighêje hemû bajarên sûriyê, û ranewestin hetanî hemû daxwazên gelên sûriyê bi ereb,kurd û miletên din, bi cih bên.

Gereke bê gotin, ku ev tevgera protêsto ya aştîxwaz a gelê kurd, stuna herî sereke ye ji bo karê niştimanî-dêmoqratî li ser rêya guhertinan li Sûriyê, lewra erkê hemû niştimanperwerên erebe, ku bi berpirsyarî berê xwe bidin vê xebatê û bê westan xebata hevbeş bikin tanî armancên gel ji bo guhrtinan bêne cih.

Bila herkes bizanibe ev tiştên ku ez dibêjim, bi tenha pêşniyazin!!!

Kî Xeznewî kuşt û ji bo ci??

Di ragihandina xwe a herî dawî de, eşkira rêxistina mafên mirovan (Amnistî International) destheladarên Sûriyê wek berpirsiyar li ser kuştina şêx Xeznewî destnîşan kirin, di vî warî de gelek kesên cavdêrên ereb ,dostên kurd jî bêtirs û eşkira rêjîma sûriyê tawanbar kirin. Ji wana: nivîsarên birêz – Ahmed Abu Meter- (endamê damezirvanê “ Komîta erebî bo piştgiriya xebata gelê kurd “, û birêz – Nîdal Maaluf – (serokê sayita Internet a sûrî “ Arab Newis “; ev helwêstên eşkira piştî ragihandina wîzareta Navxwe, a ku navê pênc kesan wek xwînrijên Xeznewî destnîşankiribûn, hatin. Lê mixabin helwêsta hin partî û girupên kurdan li ser vê bûyerê, cihê şermezarî û dilxemgîniyê bû; hina ji wan digot: " arê hinek şop li ser laşê şehîd hebû " û " ev berpirsyariya axlaqî ya desthelate " û hina jî da ku ava rûyê xwe bişon daxwaza " komîteke lêkolînê li ser hûrgiliyê vê tawanê rawestin " û hina jî da ku hebûna xwe diyar bikin, gotin ku " wêneya bûyerê ne zelale ".. weke em dibênin ev helwêst dûrî rastiya bûyerêne û li dora wê dicing û tên; lewra ew dikevin xana berjewendiyên girup û kesayetî de, ji ber wê geleka bi rêya girtina wêneyan li tenişta zarokên şêx û şer li ser derketina di kenalên esmanî de (TV) ji bo xwenîşandanê, neku ji bo nîşandana helwêsta neteweyê a rastteqîne. Tevgera Ixwan Al-Muslmîn jî xwestin rêya wan girupên kurdî bigrin, dema di ragihandinên xwe de eşkira kirin, ku pêwendiyên şêx bi wan re hebin, lê hemû kes dizanê, ku Xeznewî bi bîr û helwêsyên

xwe dijî – îslama siyasî – bû û di nav wan de jî ew tevger.

Ji bo ronkirina bûyerê û gihêştina rastiyê, pêwiste gengeşeke cedi bêkirin, da ku helwêsta rast beramber bi şehîdkirina şêx were standin, a ku bi dîtina min li ser çend bingehan dirust dibê:

- Eşkiraye, ku di pêkanîna bûyerên weha de, ên ku kerakterê siyasî-nejadperistî ne, tucarî ên ku pê rabûne û şahid nayên dîtin, ji ber ti belgenameyên yasayî dijî wan nînin; ew berî hemû tiştî girêdayî berpirsyariya niştimanî, parastina mafê mirov û hesta mirovayetî ye, her weha girêdayî kerakterê rêjîma sûriyê ye, a dîktarorî ku dijî mafê mirovane û di navde jî ê kurdan; ji ber wê tenha di bin sêbera rêjîmên dêmoqratî de komîtên lêkolînê ên bêlayen û serbixwe dikarin bighêjin rastiyê; ez li vir dipirsim, ka komîtên piştî bûyerên adara buhirî gihaştine çi?!

- Ji bo standina helwêsta rast, pêwiste bê dû dilî û tirsê organên parastinê bi giştî û herdû baskên wê (a eskerî û a siyasî) bi taybet, werin reswekirinê, nemaze serokê dosiya kurdî ji 30 î salî û bi virge, berpirsê parastina siyasî di serdema niha de, û berpirsê parastina eskerî di wê çaxê de Lîwaa Mihemed Mensûra. Li gor zaniyariyên ku hene, ew berpirsê yekeme di pilandanîn û pêkanîna kuştina şêx de ye, we çawa berpirse di kuştina Al-Herîrî de li Libnanê. şan û şudden vî kesê parastinî di pirsa kurdî de pirin; di serê wê de şewata zindana Hisîça (Al-Heseke) a nawendî û a ku 60 mirov têde hatin şewitandinê , da ku xwe ji çend kurdan ê ku sere xwe jer ne di tewandin. xelas bibe; destê wî di şere kurdan xwe bixwe de dirêj bû, nemaze ji sala 1994 an ve bi taybetî şere PKK dijî tevgera kurdên başûr, û her weha di şerê birakujî de jî ê ku bi sedemên wê bi sedan şehîd ketin, rola wî hebû. Her wise ew çavdêrê yekem bû li ser rêkxistina peymana –Adana– û gereke ji bîra me neçê, ku ew endaziyarê (Muhendis) perçebûnê ye di tevgera kurdî de, û pilandananê guhrtina serkirdayetî partiyan bû; bi taybetî bilindkirina hin kesan û dijberiya hinekî din; bi gotinekî ew ji roja ku hatibû Qamislo (dema geşbûna desthelatiya Hafiz Al-Ased) û tanî vê rojê mijûlî wan tiştên ku li jorê me bi navkirine. Ev rawestana bi kûrî li ser rola lîwaa Mansûra, ne ji diberatiya şexsî hatiye, lewra ew nêzîkî 30 î salî di dilê navçeya kurdan de jiya ye, û bi hemû zanebûna xwe tovê (bizrê) bêbextiyê,

dijberatiya hevûdu, jihev nehezkirinê û bêbawerbû di tevgera kurdî de çandiye, lewra demeke dirêj dive tanî mirov ji ziyana wê ferhengê rizgar bibê!

- Di rewşeke wek a welatê me de, ku îro rêjîm di krîzeke mezin de derbas dibê, pêwist nake, ku welatparêz li ser hûrkiliyan bikevine pêsîrê hevûdû, ji ber rêjîm bixwe berpirsiyare di ber hemû bûyeran de; giring ne ewe, em lê bikolin ka kîjan organê parastinê (siyasî, eskerî parstina dewletê ..) bi van karên kirêt di rabe, ji ber di nav wan bixwe de jî dijberatiya berjewendiyên şexsî heye, û her organek karekî dike bê ku ê din bizanibe – di rêjîmên parastinî de wise ye – lê giring ewe, gelo çima desthelatdar bê deng dimênin û çavên xwe dadixin?!

- Min di gotareke xwe de, piştî revandinê bi rojekê, diyar kiribû, ku mirovekî wek Xeznewî bi hemû xesiyetên xwe ve, dihêle ku mirovê yekem bê ji bo rakirina wî ji meydanê, nemaze di şertên îro de; min ji bo saxiya wî banga mangirtin û rêveçûnan di navçeyên kurdan de kiribû, û di dawî de ez weke erk dizanim, ku bêjim; serkirdayetiya partiyên kurdî tanî niha, ti ders ji serhildana adara 2004 an wernegirtin e; hêvî heye, ku niha xwîna şehîd Xeznewî bibe palpişt ji bo helsengandina siyaset û xebata rabirdû (pêşerojê), da ku bikaribin bi erkên xwe ên netewî û niştimanî rabin, lewra tê xwestin karê xwe ê rêxistinê bênin ser hev û dest bi avakirina komîtên hevbeş bikin ji bo bi rêvebirina xebata siyasî, ragihandin û cemawerî – bi kêmasî – di rewşên awarte de a ku weke em îro tê de derbas dibin.

şehîdên guhertinên dêmoqrasî ji "Qamişlo" tanî "Beyrut"

Dema hemû libnaniyan bi yek deng û yek vîn û bi alîkariya navnetewyî biryara derxistina leşker û organên qirkirinê ên sûriyê, ên ku bi dehên salane welatê wan dagîr û wêran kirine, ji welatê xwe derbixin, dan, rêjîma sûriyê neçar ma û serê xwe li ber vê vinê danî û bi lez û bez ji libnanê derket, lê yekser hewl da, ku taktîka karên xweyî qirêj biguhere, da ku li gel rewşa navçe,herêm û cîhanê biguncê. Dijberî siyaseta berê a ku rêjîma – Assadî – (binemala Assed) bi ronahiya kesk a Amerîkî-Israîlî Libnan û Sûrî bi zora çek û haleta eskerî û bi destê Ceneralên, ku karê talankirinê bi şêweyê rêxistinên Mafiya bi rêve dibir, em dibênin ku îro wê siyaseta xwe guherandiye û bi biryara hakimê eskerî li - Encer – teknîkeke nû li gor prînsîpên: êrîş

baştirîn haleta xweparastinê ye – bi kar tênê; wek diyare vê carê ne eşkiraye, belê bi rêya organên nehêniye, ên ku ji bo parastina rêjîmê, kuştin û windakirina dijberên (opozîsyon) wê hatine avakirin. Dema em tektîka

-xwebergirtinê- bi bîr tênin mebesta me ewe, ku îro çarenûsa rêjîm ê û organên wê ên qirkirinê ber bi dawiya xwe ve diçin; ji bilî wê jî gereke hemû berpirsiyar li ser karên xwe ên qirêj ku eva serê 30 î saliyê li Libnan û Sûriyê dikin, werin dadgehkirin, û ti hêz- kongira Bass jî di nav de – nema dikarê wan rizgar bikê, ji ber wê vê ev haleta eskerî, parastinî û Mafiyayî bi hemû hêza xwe ve berdewam bê li ser windakirin û kuştina dijberên xwe li hundir û derve, bi taybetî kesên ku xwedî helwêstên eşkira û zelalin beramber tawanên destheladarên Sûriyê, lewra sexsiyetên weha dikarin hemû tiştî eşkira bikin, dest deynin ser birînan û tawanên wan derxin meydanê!!

Di vê derheqê de, em nikarin pirsa şehîdkirina şêx Xeznewî û kuştina Semîr Qesîr ji hevûdu cuda bikin, ji ber li gor cografiya siyasî herdû bûyer di çarçova yek sistêma parastinê de rû dane; a ku me li jorê gotibû ku amadeye ji bo parastina xwe bi hemû şêweyî dijberên ku tehluka wan heye, ji holê rakin, bi vî hawî meydana cengê berdewame û dibe, ku dirêjtir be ji bîr û boçûnên me?! Heger em kesayetiya herdû şehîdan bidne ber hev, em dikarin bêjin, ku ji xênî cûdabûna netewî û olî, ew herdû bê ku hev binasin, di gelek tiştan de weke hev bûn, wek: xebat ji bo guhertinên dêmoqratî bi astî û rêya helbijartina, daxwaza mafên çarenûs bo hemû miletan, helweşandina rêjîmên zordest û yekpartî, pêkanîna azadiya bîr û baweriyan, avakirina civaka sivîl û parastina mafê mirovan, cihêkirina olê ji siyasetê, şer dijî têrorê, nemaze a ku bi navê olî tê kirinê, dijberiya siyaseta sofen û nejeadperest, rawestan beramber destdirêjiya dewletan di karên navxweyî de û di dawî de danîna sînorekî ji zilim û zordestiya organên parastinê re, nemaze ên rêjîma Sûriyê; belê ev bûn tiştên hevbeş di navbera herdû şehîdan de: yek ji wan şehîdê buhara Sûriyê erebî-kurdî û ê din şehîdê serxwebûna Libnanê, ên ku bûne qorbana siyaset û tektîka rêjîma Ba'ss a nû.

Cihê gotinê ze, ku meydana siyasî û cemawerî dijî sistêma organên parastinê bi serokatiya Sûriyê li Libnanê bi hêztire û bi

rêkxisttire ji a ku li Sûriyê bi xwe ye, lewra xebata opozîsyona Libnanî xwedî bingeheke dîrokîye û li navçeya Rojhilata Navîn bûye cihê şanaziya her niştimanperwerekî. Me û bi milyonan kes dîtin çawa dirûşmê serhildana wan eşkira, zelal û bê tirs bûn, nexasime ên balkêş, weke: bi navkirina berpirsên parastinî, di nav wan de: Rustem Xezalî, Xazî Kena'n, Cemîl Al-Seyid û Mistefa Hemdan, û gelekêd main, ên ku baskên sereke bûn ji rêjîma Sûriyê re!!

Tê zanîn, ku miletên Sûriyê bi dirêjahiya 30 î salî tûşî têror û zordestiya heft (7) organên parastinê bû ye û gelek serok û berpirsyarên wan hebûne, lê beramber bi kurdan, em dikarin navên çend kesên xwiya û li ser sê qonaxan bênin ziman: A'qîd Hikmet Mîna serokê mekteba duhem li Qamişlo, Yusif Tahtuh dîrêktorê (mudir) nahiya Amudê û serokê parastina siyasî li Şamê û ê din navdar Lîwaa Mihemed Mensûra ye, berpirsê dosiya kurdî û ê ku eva 30 sale serokatiya parastina eskerî li navçeyên kurdan kiriye û di dema hazir de serokê parastina suiyasî li sûriyê bi tevahiye; ew tê hejmartin weke berpirsê hemû êş, zilm, nakokî, perçebûn û gelek karesatên ku hatine serê kurdan: ji girtin, iskence, windakirin û kuştina xelkê, nemaze di serhildana adara 2004 an de û hetanî kuştina şêx Xeznewî. Lê tiştê herî ecêb ewe, tevî van hemû tawanên ku ev ofserê leşkerî pê rabûye jî, tanî niha ti kes di meşan de nav û tawanên wî nahênê ser ziman û diruşmên dadigekirina wî bilind nakê. Ma gelo ev ne ciyê pirsê ye?!!

Nirxandinek GiŞtî Li Ser RewŞa Kurdên Roĵavayê Kurdistanê (Suriyê)

Demhat Hezexî

Pêşgotin:

Kurdê roĵavayê Kurdistanê(Başûrê biçûk) xwedî dîrokek kevnin. Lê, serpêhatiya vê dîrokê dagirtiye ĵi, nexweşî, sitemkarî, nemafî û bûyerên erĵeng! sedemên vê yekê, siyasî, aborî û civakî ne, û ev bi dagirkerî û mêtingeriyê ve girêdayî ye. Siyaseta sor û sipî li hemberî gelê me, bê sînor hatiye bikar anîn. Ew bûne daqoqek tund li raserî kurdên roĵava. Lê, kurdên roĵava li beramber zext, êrîş, kuştin û planê kirêt nasnameya xwe ya kurdî parastiye û di rewşa îro de ĵî, ĵi bo destxistina mafê xwe yê rawe, xwe dike pira hemû coreyên fedekariyan.

1. Kurte Dîrok

Heta roĵa îro, gelek lêkolîn û lêgerîn li ser dîrok û rewşa kurd û kurdistanê hatine kirin û ev kar û xebata hêja, hêjî berdewame. Lê, êdî xweş diyare, Kurdistan welatek dewlemend û xweş e. Qandî dewlemendiya xwe ĵî, bihuşt e!

Gelê kurd ĵi rêza kevintirîn gelan tê peĵirandin. Bihuşta Mezopotamya Kurdistan, êdî li ser zimanaye. Lewre, wê dayiktî ĵi şaristaniyê re kiriye. Bi dilek vekirî û bi aram, ez dikarim bibêĵim, Kurdistan kaniya şaristaniyê ye. Ĵi ber ku, li vir, li ser vê axê şaristanî pêşketiye, belav bûye. Anku, ew dergûşa şaristaniyê ye. Li ser vê axê genim (koka genim)

hate dîtin, cara yekem giyanwer li ser vê axê hatin kedî kirin, heta şoreşa çandiniyê) aliyê mirovayetiyê ve li vir pêşket baĵar û baĵarvanî li ser vê axê (axa zêrîn) pêşket. Lê, mixabin heta doh me pê nizanî bû. ĵi ber ku, mêtinger û dagirkeran welatê me xira kiribûn, dîrok li gorî xwe nivîsandibûn. Lê, (giya di bin kevir de namîne), rastî nayê veşartin, diranên dîrokê tûĵin, û îro her diçe, rastî dibe ziman li ser qada ĵiyana nivîskî.

Belê gelê kurd xwedî dîrokek kevnareye dîroka xwe bi hezar salan direĵe. Ev dîroka ku di tariyê de veşartî bû, her diçe ronî dibe, zelal dibe û li vir hêĵa ye mirov beĵina xwe li ber keda kolanvanan (erkologan) bitewîne. Lewre, biriya ked û karê wan yê pîroz, toza li ser birtûka dîrokê radibe û ewrên reş belav dibin, asîman bi rengê xwe yê deryayî xwe diyar dike û dibêĵe, (ev erastiya min) û rastiya gelê me ĵî, hêdî hêdî çavê xwe vedike.

Li gorî zimanê dîrokê, berî împeretoriya Aşûr herêma Mezopotamya dagir bike û zagonên xwe yê tûĵ bike şûrek daleqandî seranser vê axê, gelê kurd di nav ĵiyanek azad, aştî û aram de, diĵiyan. Lê, piştî serdestiya ĵi sed salî zêdetir ya împeretoriya Aşûr li ser herêma navbera her du çeman(Dicle û Firad), gelê Medî (gelê kurd)bi alîkariya gelên herêmê, di encama şer û cengê ĵi sed salî pirtir,b.z. di 612 an de împeretoriya Aşûr ku peytexta xwe Nînawa bû, hildeweşînin û serokatiya Mediyan azadiya ku gelên vê herêmê bi esreta wê bûn, diyarî gelan dike.

Lê, piştî xirakirina împeretoriya mediye b.z 550 yande li ser destê Persan, ê dî dîroka Kurdistanê dibe dîroka bindestiyê. Roma, Îskender, Ermen, Bîzans, Îslam û heta împeretoriya Osmanî demek direĵ dibin hikumdarê Kurdistanê.

Gelê kurd ĵî derbasî ĵiyaneke din dibe ku ĵêre dibêĵin Mîrîkatî. lê, gelê kurd di direĵahiya dîrokê de, gelek caran dewlet ava kirin, yek ĵi van dewletan dewleta Dostkiyan bû.

Evê dewletê piraniya parçên kurdistanê kiribû naw sînorên

xwe. Lê, bingeha vê dewletê, piraniya xwe li parçê Kurdistana Roĵava bû. Lê piştî qonaxên dewlta Eyûbî ĵî, careke din kurdistan derbasî pêvaĵoyek nû bû.

2. Kurdistan Dibe Pariyê Devê Guran.

Navê vê pêvaĵoya nû, talan, wêran kirin, kuştin û koçbertî bû. Ĵi ber ku, tirkên hov ku ĵiyana wan li ser pişta hespên talan kirinê bû, berê xwe dan Kurdistanê. Selçûqî û Moxuliyan kurdistan wêran kirin, her dever kirin doĵeh! gelê kurd di komkuĵiyan re derbas kirin. Di sala (1516) an de împeretoriya Osmanî bakur û roĵavayê Kurdistanê kirin bin hikumdariya xwe Lê , di encama peymana qesra şîrîn de (1639) Kurdistan kirin du parçe. Anku, roĵhilatê kurdistan ma naw sînorê dewleta Safewî de. Lê, dîsa di sala(1923)yan de(peymana Lozan) kurdistan dibe çar parçe. parçekirina kurdistanê ĵî, dibe sedemê gelek serhildanan. Lê mixabin, tevahiya serhildanên qirnên nozdeh û bîstan bi rêbazên hovane têne tune kirin. Li gorî peymana Sayikis Pîko, başûr û roĵava bi Îraq û Suriyê ve hatin girêdan. Lê, Suriyê û Îraq di bin rêveberiya Firansa û Îngilîzan de bû. Di salên (1920/1921)an de parçê kurdistana roĵava di temamî kete bin rêvebiriya Firansa.

1- Di warê civakî û Aborî û Siyasî De Rewşa Roĵava

Roĵavayê kurdistanê ĵi du herêman pêk tê. Yek herêma Cizîrê, du herêma kurmênc. Lê, mezintirîn herêm li Suriyê, Cizîre.

a- Herêma Cizîrê:

Herêma Cizîrê, ĵi Dêrik, Rimêlan, Cewadiyê, Qamişlo, Amûdê, Dirbêsiyê, Tirba sipî, Hisiçe û gelek baĵarokan pêk tê. Ev herêm ĵi aliyê bin erd û ser erda xwe ve pir dewlemende. Lê, xelkên me yên li vir başeba sûd ĵê wernedigirtin. baĵarên wek Qamişlo û Hisiçe heta nêzîkî sala1923 an ne baş bûn. Bi awakî giştî deverên din ĵî, ĵiyana

xwe li gundên ber sînorê Tirkiyê derbas dikirin. Lê, Firansiya giranî da herêma Cizîrê, xwestin çandiniyê pêş bixin. Lê, dema Firansiyan bi riya navgînên hilberînê

yên pêşketî, çandin pêşxistin û li gundan avahiyên fermî ava kirin, rewşa Cizîrê ber bi guhartinê ve çû û aborî li ser asta Suriyê derkete pêş. Îro jî, parêzgeba Hisiça di warê hilberîna berhemên xwe de li ser asta Suriyê duyemîne, berhemên ji vir derdikevin evin, petrol (Qereçox, Suêdiyê, Rimêlan..) genim,ceh, nok, nîsk, av, pambû.

B-Herêma Çayê Kurmênc:

Herêma çiyayê kurmênc bûye du parçe, parçek ma di bin destê dewleta Tirk de û parçê din di bin deshilatiya Suryê de ye. Lê, ez li ser parçê, li Suriyê radiwestim. Herêma çiyayê kurmênc dikeve roj̀hilatê çiyayê gewir. Ew beşê herî roj̀ava ji başûrê biçûke, firehiya xwe ji roj̀hilata roj̀ava 55 km ye. Lê, ji bakur heta başûr75 km ye, firehya axa xwe wê jî, 4124 km ye û li gorî serj̀imêrên herî nêzîk hij̀mara nişte cihên wê 442000 kese.

Ev herêm ji aliyê çandiniyê ve zêr e û kaniye. Ava û hewaya herêmê ji çandiniyê re pir guncawe, havînên wir pir germ derbas dibin. Lê, zivistanên xwe ji barîna baran û befrê, zêde xweş û dewlemend derbas dibin. Berhemên li wir derdikevin ev in: genim, nîsk, sêv, hinar, tirî û zeytûn. Li herêma kurmênc bi milyonan darên zeytûnan li pey hev rêz dibin û herêma kurmênc bi zeytûnên xwe navdare. Li Suriyê ev zeytûn bi zeytûnên kurdan têne nas kirin.

C. pêşesazî:

Li roj̀ava yê kurdistanê pêşesazî nîne, ne li herêma Cizîrê û ne jî li herêma kurmênc dewleta Suriyê destûr nedaye ev şax pêş bikeve. Li van her du herêman tenê di warê çêkirina merşik, teneke hwd, pêşesazî yek car mirî heye. Bêguman, nepêşketina pêşesaziyê li roj̀avayê kurdistanê, bi sedemên

civakî, aborî û siyasî ve girêdayî ye.

G-Bin Erd û Ser Erd û Avên Roĵava:

kurdistan welatê çeman e.di warê avê de pir dewlemende, avên li pêş, çemê Dicle, çemê Xabûr, gola Xatûn û çemê Efrîne, wekî din gelek kanî û golên biçûk hene, ku axa roĵava tîn nahêlin. Roĵava, qandî avên xwe ĵi aliyê bin erd û ser erda xwe ve ĵî dewlemende û ev dewlemendî ĵi axa tev zêr difore, bi taybetî li herêma Cizîrê petrol diherike, xaza xwezayî, madên hesin, made kibrît li vê herêmê geleke, hêj di sala1956an de petrol li Qereçox dîtin, li herêma Cizîrê û li herêma Çayê Kurmênc, genim, ceh, pembû, nîsk, nok, sêv, henar, zeytûn, tirî û hwd. Dewlemendiya xwe heye û pêşkêş dike,

d- civak:

1- Axa (feodal), di serdema kevin de, pergala li roĵavayê kurdistanê, xwemaliya Axa bû. Ev kesên ha çîneke diyar kar bû, li vî parçî. Ew xwedî biryarên bê sînor bûn. Serokê êlan bûn û her yek ĵi wan xudanê bîst-sih gundan bûn. Lê, di roĵa îro de ev pergal nemaye, yan bi tiliyan tên hiĵmartin.

2- Oldar, kesên oldar, yan ĵî kesên xwe berpirsiyarê ol ditîn, di Kurdistanê de pir bûn. Bi demê re ev bûne xwedî erdên firh û gelek û bûne asteng pêşberî pêşketina civakê. Beravaĵî vê, kêm kesên oldar xwestin civakê pêş bixin.

3- Cotkar, beşê herî zêde li Kurdistanê cotkarin. Lê ev beş herî heĵar û bê xudanin. piraniya xwe bi zagonên civaka êlîtî ve girêdayî bûn. Sitemkarî li ser wan şûrek tûj bû. Di serdema Firansiyan de, rêveberên Firansî, çawê xwe ĵê re digirtin. Lê, piştî teknîka çandiniyê pêşket, pergala kevin belaw bû, ev heĵmar kêmbû.

4-Karker, beşek kêm ĵi karkerên kurdan hebû. Ev beşî, piraniya xwe li baĵaran wek Şam, Helep û Hemayê nîştecih bûn û li

pêşesaziyên kêm û zivik de kar dikirin. Lewre, li Suriyê pêşesazî sivike. Bi demê re gelek jî cotkarên kurd bûne karker. Ji ber ku pêşketina teknîk û pêşesazî, ev bi xwe re anî. Lê, hem û jî bi diravên kêm kar dikirn.

5- Çîna Bircuwaziya Biçûk, ev beş jî,ji bijîşk, parêzer fermanber û hwd, pêk tê û piraniya xwe li bajarê Ereban dimînin. Lê, bilindbûna asta perwerdê li rojavayê Kurdistanê, ev çîn bir zêde bû.

6- Êl, li herêma Cizîrê û kurmêc pir êl hebûn (hin jî van êlan ji bakurê kurdistanê hatine Rojavayê Kurdistanê), êlên heyî jî, evin, Şikakan, Mîran, Hesinan, Aliyan, Hevêrkan, Şîtî, Mêrsinî, Bobilan, Kîkan, Emikan, Şêxan, Berazî, Melê, Duquriyan, Gabarî, Bînar alî, Beyan, Cûm, Etmekan, Rûbarî, Aşitî, Xistan....). Lê di roja îro de piraniya van êlan hatine helandin, tenên navê wan man e. Anku, pergala (sîstem) êlîtî nemaye.

7- Perwerde, xala herî lewaz û xirab li Rojavayê Kurdstanê, rewşa perwerdê bû. Di serdema kevinde û di dema Firansiyan de , perwerde li mizgeftan dihate dîtin. ji ber ku Firansiyan ne dixwest saziyên perwerdê li vir pêş bixin, hêj di wê demê de encamên siyasî yên perwerdê didanîn ber çavê xwe. Di sala 1946 an de gava Suriyê giha azadiya xwe, di warê perwerdê de gavên girîng hatin avêtin. Lê, ev gav giranî li herêmên ereban hatin avêtin .Anku, guhartinên civakî, zêde li rojava pêk nehatin. Lê, her çendî dewleta Suriyê gelê kurd ji mafê rawe bê par hişt jî, beşek ji meleyên rojava ristek (rol) berçav di van mizgeftan de leîstin, van Meleyan li gel perwerdeye Olî, perwerdaya netewî jî didan şagirt û gundiyan. Vê perwerdê hişt ku di pêşerojê de, tevgerên siyasî derkevin.

2- Ji Berê De Jiyana Kurdewarî

Li Cem Kurdên Rojavayê Kurdistanê Hebû

ser kurdên roĵava kirine. Para bayê serhilanên Bakur (wek Serhildana Şêx Saîdê pîran) di warê şiyar kirinê de geleke. Lê, keda rêxistina Xoybûn ĵî ku di sala 1927 an avabûye, qet nayê ĵi bîr kirin.

3.Xoybûn(1927_1932)û Roĵava

Piştî şerê cîhan ê yekemîn, rêxistina Xoybûn li Suriyê hate damziran. Şaxên vê saziyê, li Şam, Helep, Hisiçe,Tirkiyê, Îraq, parîs û li gelek baĵarên din belav bû. Rêxistina Xoybûn gelek kesayetiyên ronakbîr, fermanberên kevin ên dewleta Osmanî, serokê êl û yên wek wan di bin banê xwe de kom kirin. Haco Axa ĵî, yek ĵi van kesan bû. Dîsa di nav sazuman kariya vê rêxistinê de, Celadet, Kamîran, Sureya, Emîn Bedirxan û Memdûh Selîm Beg ciyê xwe girtin.

Damezirandina Xoybûn , netwperestiya kurd kire pêvaĵoyek e nû. Armanca Xoybûn ew bû ku desteka Roĵava, Bakur û Başûr bide şerê gêrîla yê ku nawenda xwe li çiyayê Agirî bû. Ev şer ĵî, dibin serokatiya Îhsan Nûrî Paşe de bû, piştî avakirina Xoybûn, Îhsan Nûrî Paşe çalakiyên leşkerî li diĵî artêşa Tirkiyê, li dar xist. Lê, di sala 1930an de, bi hovêtî ev serhildan hate şikestin.

Piştî şikestina serhildana Agirî ĵî, Xoybûn xebata nav gel berdewam kir. Bi taybetî li Roĵavayê Kurdistanê û li baĵarên Ereban, xoybûn çalakiyên şiyar kirina gel, bi şêwazek serkeftî dikir. Li hember rêxistina xoybûn Firansî bê deng nediman û hemû kadir û xebat karên Xoybûn dişopandin.

Lewre, wan nedixwest xebatên şiyar kirinê di nav kurdên roĵava de bên kirin. Lê, Xoybûn, di warê hestên netewî de û girêdan bi axa welat ve, pêngavne girîng li roĵava avêt û ev ĵî, ĵi bo pêşeroĵa kurdên roĵava bû bingehek.

4- Di Têkoşîna Rizgarkirin Suriyê De Hêza Kurdan Diyarker Bû.Gelê Suriyê di encama

têkoşînek dem dirêj ji şerê çekdarî û serhildanan, ji bin desthilatiya Firansî derket û giha azadiya xwe. Lê, diazadiya Suryê de hêza gelê kurd diyarker bû. kurdên Roĵava bi hem û hêza xwe tevlî têkoşîna azadîkirina Suryê bûn. ji ber vê sedemê, hêzên Firansî pir caran êrîş anîn ser gelê kurd û pircaran bi riya belefiran herêmên kurdistanê bombebaran kirin.Lê, têkoşîna kurdan bo rizgarkirina Suriyê li gelek deveran serî hilda. Serhildana Biyandor, Amûdê, herêma

Kurmênc, serhildana Îbrahîm Henao(ew bi xwe kurde) û heta pevçûnên li Şamê yên li dijî Firansiyan, nîşana vê yekê ye. Nimûne,di sala 1919an de li herêma Kurmênc serhildanê destpêkir. Hêzên Firansî di riya Sikenderonê re derbas bûn. Lê, kesayetiyên wek Seydê Dîko, Ehmed Rûto....gel kirin tevgerê û li dijî Firansiyan rabûn.

Dîsa di wê demê de Îbrahîm Henano li herêma Helebê serî hilda û ev serhidan li gelek deveran belav bû. di sala 1921ê de ev serhidan ji aliyê Firansiyan ve hate vimirandin. Li herêma Cizîrê jî gel serî rakir. Heta gelê kurd di sala 1925 an de tevlî serhildana Şamê bûn. Li vir xweş diyare ku kurdên roĵava fedekariyên mezin pêşkêşî rizgar kirina Suriyê kirine.

5- Derbên Leşkerî û Nedîtina Gelê Kurd

Dîroka Suriyê jî, wek dîroka gelek welatên Ereban ji derbên leşkerî dagirtiye. Di 30ê adara 1949an de Hisnî Zayîm derbeke leşkerî li dar xist. Lê, di 14 yê tebaxa 1949an de, di bin serokatiya Samî Henawî de derbeke din li dar. Dîsa di 19yê kanûna yekê de Edîb Şîşeklî derbeke din a leşkerî li dar xist. Lê, ev hemû derbên leşkerî gelê kurd dan alîkî. Anku,li hemberî mafê kurd bêdeng bûn, çavê xwe digirtin û keda gelê kurd ku di bin xizmeta avakirina dewleta Suriyê de rijandî, ji bîr dikirin.

6- Desthilatiya Beas û Pêvajoyeke Nû ji Bo Gelê Kurd

a- Ji bo têgihiştina siyaseta Beas teqez têgihiştina îdeolojiya Beasîtî pêwîste

bêguman îdeolojiya partiya Beas ji aliyê Mîşîl Efleq û Zekî Ersoz ve hatiye afirandin. Ev her du kesayetî di hemen katê de sazumankarê partiya Beasin, naveroka ramanê wan nijadperestiye. Tê zanîn her du kes hezkarê ramanê Naziyan bûn û dixwestin rengê Naziyan bigrin. Ev her du kesayetî di naw felsefeya Hîtler de kûr çûbûn û li gorî wê destûrname tomar kirin ku ev destûrname ji bilî ereban tu gelên din nasnake. Felsefa wa her tişt ji bo ereban,

Tenê ereb rastin! û di xwestin vê îdelojiyê di nav ereban de biçînin.

b- Nêrîna Wan li Ser Kurdan!

Di nêrîna Îdeolojiya Besîtiyê de, kurd nîn. kurdên heyî jî, ji derve hatine. Ew mirovên biçûkin, bêkesayetîne û tu cudahî di nawbera wan û(giyanwere) de nîne. Tenê mafê wan heye xizmetkarê ereban bin. Belê, rastiya nêrîna îdeolojiya Beas li hemberî gelê kurd, heta dawî nijadperestî û şofîniye. Lê, rastiyeke din jî heye, Îdeolojiya Beas tu carî nikariye ramanên gelê kurd (gelê ku berî hatina Osmaniyan bi sedê salan li ser vê axê jiyan kiriye) bike di zîndanê de.

G-Tirsa Hikumeta Behsî û Li Hemberî Kurdan Gavên Nijadperestî:

Hikumeta Behs ya Suriyê, di salên şêstan de giranî da Rojavayê kurdistanê. Sedemê vê yekê pêketina agirê şoreşa li kurdistana Başûr(Îraq)bû.

Desthilatiya Beas bi şêwazek eşkere gelê kurd kir armanca tivinga siyasî. Êdî jiyana gel tev bû lêdanxane. Dixwestin giyana wan bikujin. çand û jiyana kurdî qedexe kirin. Heta ji hin serokên êlên kurdan xwestin ku ew ji dev

nijadê xwe berdin û xwe bikin ji nijada ereb û disala 1962an de serhijmar pêk anîn û bi deh hezaran kes hiştin(îro ji sêsed hezarî zêdetir kurd bê nasnamene)bê nasname û piştî wê bi çend salan, siyaseta kemera Erebî pêk anîn. Gelek kurd bi darê zorê ji ser erdê wan rakirin, birin naw ereban û ereb anîn cihê wan. Her wisa di sala 1966an de hikumeta Beas dest bigirtina kurdan kir, da siyasetên wek kemera Erebî bighîne armanca dawî.

Li roja 13/11/1970yan Hafiz Esed bi derbek leşkerî hate ser desthilatiya Suriyê. Lê, dîsa siyaseta Beas her wek xwe ma.

7- Naxwe Çare Çiye?

Ji damezirandina partiya Beas û heta îro, li hemberî gelê kurd gelek cara jî, siyaseta zor hate bikaranîn. Di zîndana de, gele kesatiyên kurd kuştin. komkujiyên wek Sînema Amûdê, zîndana Hisiçe û bûyera Qamişlo li dar xistin. xwestin kurdên rojava bi riya siyaseta sipî bihelînin û wan bikin ereb. Lê, nher çendî Beasiyan hin armancên xwe pêk anîn jî, lê wan tu carî nikariye nasnema kurdên rojava ji holê rakin. Berava jî vê, îro asta gelê rojava tê de dijî, pir bilinde. Di warê huner, çand, rewşenbîrî û hestên netewî de pêşketiye. Bûyera Qamişlo jî, zimanê vê pêşketinê ye.Heta dikarim bibêjim, bûyera Qamişlo kombûna dehê salane ku di kesatiya bajarê Qamişlo de teqî û li seranser rojava belav bû û xwe gihande bajarê Ereban.

Îro, êdî rewşa Suriyê destnîşan dike, tu riyên

din ji derveyî guhartina partiya Beas û pêngavên demokratîk tu riyên din nemane.Ya yê destûrname bê guhartin û li ser zagonên demokratîk destûrnamek nû bê amadekirin û derbasî jiyanê bibe, yan jî yê rejîm ber bi mirinê ve biçe. Ji ber ku asta gelê kurd û cîhanê ya îro vê yekê ji mere dide diyar kirin.

NETEWE

Osman Karavil Tekoþîn

Kurdistan a Bakur – Amed

Netewe avaî ek girîngû giran buha yeî di nav civatan deî Ji ber ku hemû cîneî bir û baska di nav xwe de bi cîh dikeê

Netewe avaî ek dîrokî û esasîyeî neteweî bi xurt bun û geþ bun a serma ye derketî e holeê Netewe li axa xwe û li xakên xwe xwedî derketiye û buye dewletê Yekem car li Yurupa ê dewlet ê yek neteweî wek Îtalî Elemanî u Fransîî li rojhýlatê Yurupa ji dewleten pir netewe wek Avuturya î û Macaristan damezrineê

Her çîneî birî bask û keþayestî dive ku matê xwe di nav mafê netewe de bibîneê Ev rastî û bawrî komên moriva dike netewe û devletê

Diroka dinê evê rastî ê bi sedancara ispat kirîye û danî e ber çavaê

Netewe ê Kurd jî wekî her netwe î ji çîneî birî bask û kesaetî ê heja û giring pêktêê

Kurdîstan a Baþur bi vê rewþa xwe a azad û xwe bi xwe reve birîn û sazkirinî buya minak ji bo her perçe ê Kurdistan ê jiê Û buye hêviyek gelek girîng û mezinî gewre jý bo hemu kurd ê dinêê

Ez wek kurdek kurdperwerî ev roj bi rewþa Kurdîstan a baþurî þadî bextîyar û faxrimê

Em kurd ê Kurdîstan a Bakur îdi semînerî panel û komcývîn ê xwe deî gerendarî û rêve birina Kurdistana baþur bo xwe mînak dibîninê Û dawa dewletek federalî dikinî li dewleta Tirkê

Min hêvî dýkýmî Heremi Kurdîstan a baþur serkeve azadî û pêþueçun geþû bilind beê

Ev hevîya hemu Kurdê dinê e hevîdarim û xizmetkarim ku ev hêvî a netewe î kurd wenda nebeî birze nebeê

Dive ku hemu Kurd ê dinêî jý bo ku alîkar û xýzmetkar býnê Her kurdî ji vê alîkarî û xýzmetê rê xwe hewce û

wazîfedar bibîne û qebul bikeê

Her çi kas axa Kurdîstan ê bi sînarên ne tabîîî ne rastekînî perçe bube jîî axa Kurdîstan ê yekeî ne çareê Bawerim her kurdî Kurdîstanek difikireê

Ev perçe bunî cuda cuda herem ê Kurdistan ê qebul dikeê

Her Kurd xwedî e her bihusta axa Kurdîstan êê Kurdek Hewlerî çendî xwedî yê Hewlêr ê be Kurdekî Mihabadîî Amedîî Qamiþluî ew çend xwedî ê Hewlêr ê ye î Kurdek Hewlerî an Suleymanî ew çend xwedî ê Amedêî Mihabadê e û Qamiþluî eê Bi kurtasî mafê her kurdîî di her bihusta axa Kurdîstanê de heyeê

Evê rastî ê her karbidestê Kurdîstana Baþur hemu caran tînin zimanêêê

Bi taybetî Rêzdar Kek Mesud Barzanî gelek vekirî u eþkere di 1993 an de li Enkerê di komcivînek bi xwarin u bi vekarin de anî ziman û gotê

Kurdên Kurdîstan a baþur bo me çibinî Kurdên hemû herem û bajarên Kurdîstan ê jî ewinê Hetta Kurdek ku li Emerîka jî dijî bi mafê xwe wek her Kurdîî xwedî ê mafê ciheî cuda nineê Kisedana xwe domand u gotî Kurdek Zaxoî çi be Kurdek Amedîî Kurdek Mihabadî û Kurdek Qamiþluî eweê Ji ber ku di dile her Kurdî de Kurdîstanek yek girtî û serbixwe heyeê

Rêzdar Kek Barzanî vê kisedana xwe li paytexta Komara Tirkî ê kirê Gelek Kurdperwer di vê civîne de hebunê Û bê guman morivê Komara Tirkî ê jî pêþdar bubun!

Ez jî wek Kurdek kurdperwer bi daweta Kek Þerafeddin Elçi ve bi rêxutinkar û rewþenbîr ê heja Ömer Çetin rê peþdar bumê

Lewra her pêþdervan bi daweta dîrok zan û ronak bîr ê Kurdî Þerafeddîn Elçi ve pêþdar bubuê Ji ber ku ew komcivîn ji bo bi xêranîna rêzdar Kek Mesud Barzanî buî ji alîye Kek Þerefedîn ve amade bubuê

Ez li ser kisedana peþmêrge î mezinî serokê PDK Kek Mesud Barzanîî dibêjim; dive her kurdî her malbatî her eþaîr û her parti mafe xwe di nav mafê netewe î Kurd da bibîneê An jî mafê gelî jî her mafî mezintir û pêþdetir qebul bikeêÛ her kes bi mafe xwe û bi cîhe xwe razî be! Ev pêwisteî pêwiste ji bo serkeftina netew î Kurdê

Neteweî Kurd jî mafê wî heye kuî di dinê de netewê î serbixwe û azadî xwedî ê çi mafî çi azadiî çi peþkevtin û serbýlýnd daîye neteweî be; bibe xwedîê

Netewe î Kurd rojhilata navî de demek girîng û nazik dijîê

Têkîlî Emerîka bi Îran û Surîye ve î tekîlî e dewleta Týrkî bý Emerîka û yekîtîya Yurupa ve gelek nazýk e wek mêzînêê

Her Kurd dive xwe berpirsîyar ê vê demê bibineê Sîyasetmedarî rewþenbir û ronakbîr e Kurd jî ve demê li gor mafê gel bi gerîninê Ev xebat û doz wazîfe a wan eê

Di vî warî de wazîfa karbidestên Kurdîstan a baþurî bi taybetî rêzdar Kek Mesud Barzanî û rêzdar Mam Celal Telebanîî gîngtir û girantireê Ji ber ku ev her du serokên Kurdî ji alî serokên dine ve bi awa kî miriî resmî tênenasînî wek ber pirsîyarê netewî Kurdê

Ev her du rewþenbîr û siyasetmedarê Kurdî dive ku berîya hertiþtî mafe gel bifikirin u bi parêzênê Mafê partî ê xwe bidne piþt mafê neteweî Kurdê Lewra ê ku partî damezrandîye û wan jî kirî e serokî gelî Kurd eê Divê ku Kurd jî xweî ezîtî ê rizgarbikinê Ev demî dema netewe î Kurd e!

Xwendevanên hêja min bi bohrinî serpêhatî kî Kurda dê jî Ewlîya Çelebî nekil bikimê

Piþte þer ê Çêldêranî þerê Osmanî ya û Persa (þere 1514 Þah Ýsmaîl û Sultan Selîm) û þerê Memlûk û Osmanîya an jî wergirtina Misrêî li Kurdîstan ê cîh bi çîh di nav bera Kurda û Osmanîya de þer peyda dibeê Li sêr ve yekê Sultan ê Osmanîya Selîm ê II aî ji þewirmend ê xwe ê taybetîî Kurê Mewlana Husamedîn ê Bedlîs î Ýdrîs î Bedlîs î re namek rê dikêê

Sultan Selîmî di name de dibêje mexsedame ne wergirtina Kurdîstanê e mexsedame ku Kurd li hember þîa bibin asteng ku þîa hete nîve Anatol ê neênê

Ji ber vî mudexale bi karê Kurdaî kare hundrîî geranderî nekeê

Ji begê Kurdan begekî begê bega tayîn ke û wereê

Ýdrîsî Bedlîsî î name Sultan Selîm bersîv dikeê Dibeje li verêî li hêre yekîtiyek bi bawerî û rastekînî nîneî li verê piraîkî perçe perçe heyeî kes ji kesêre biçukaî nakeî herkes dibe ezê

Ji ber ve ezîti ê dývê ku begê bega ji Seraya Sultan bête tayîn kirinê

Li ser ve namê Sultan Selîmî bi navê Fîl Yakup kesek dijvar û hovî bi nîþan û nexþê begê bega diþeyne Dîyarbekirî Amed êê Li ser ve biryar û çalekîya Sultan Selîmî li Kurdîstan ê di nav bera Kurda û Osmanîya de þer peyda dibe ê Þer hetanî 1730 di domîneê 1730 an de Kurdîstan seranser dikeve desten Osmanî yaê Xeynî heremê ku di nav xakên Îranê deyeê

Min hêvi darim di demek gelek nêzîk de parlemeto Kurdîstan ê bi cive! Û dîrok xwe du bare nekeê Lewra ev sed salî sed sal a Kurda eêêê

Wek Kurdek kurdperwerî minetdar û sipasdar ê her Kurd ê ku xizmet daye netewî Kurdî imê

DEWLETA EL- MIXABERAT DEST PÊ KIRIYE GORA XWE DIKOLE

FÛWAD SÎPAN

Ji ber guhertinên li Rojhilata Navîn tirs û xof ketiye dilê dewleta Sûriyê, loma rêjima faşîst ji tirsa hebûna pêşeroja xwe nizane çi bike.

Dewleta Sûrî, ya ku bi siyaseta El-Mixabaratê têye îdare kirin, ji vir demek berê bi qetilkirina Serokwezîrê Libnanê yê berê Refîq el-Herîrî li Beyrutê û van rojan jî bi korsanî revandin û qetilkirina Şêx Mihemed Meeşuq el-Xeznewî roj bi roj gora xwe dikole.

Dewleta faşît êdî ti sînoran nasnake, ji çalakiyên Kurdan yên demokratîk re jî rêzê nake, bi guleyan û talankirina mal û milkên Kurdan bi destê Erebên kevneperest bersiv dide.

Rêjimên faşîst ên di dîrokê de hatine û çûne, hemû di wê baweriyê de ne, ku ewê her dem bi dîktatorî li ser text bimînin. Lê cîhan êdî ji dewletên faşît re teng bûye.

Dewleta El-Mixaberat bi qetilkirina Şêx Mihemed Meeşuq el-Xeznewî xwest, mesaja tehdîdê bide Kurdan, ku ew dest ji daxwazên xwe berdin. Lê bi baweriya min dewleta Sûrî palte li lingê xwe xist. Ti kes êdî nikare pêşiya vê pêvajoya nû bigire; hilweşandina rejimê dest pêkiriye û êdî rojan dijimêre.

Rejima El-Mixaberatê dê ji holê rabe, lê gelo siyaseta partî û rêxistinên Kurd li Başûr-Rojava ji bo desthilatiyê amade ye?

Bi bîr û baweriya min, divêt partî û rêxistinên Başûr-Rojavayê Kurdistanê ji van bûyerên dawîn dersan derxînin.

1- Pêwendiyên xwe sedî sed bi rêjîma Sûriyê ya faşîst re qut bikin.

2- Bi gotinên partî û rêxistinên perçên Kurdistanê yên din tevnegerin.

3- Bi yekîtiyeke xurt siyaset û stratejiyeke nû ji bo Başûr-Rojava

amade bikin.

Bi rastî nayê fêhmkirin, ku Kurdên Başûr-Rojava bi çi mantiqî bi dewleta El-Mixebarat re dan û standinan çê dikin. Dewleta Sûriyê jî wek dewleta Tirk û Faris dijminê Kurdan e. Pêwendiyên bê bingeh û vala ji bilî zerarê ji tevgera Kurd re nîne. Loma divêt siyaseta Kurdên Sûriyê bi taybetê di pirsa pêwendiya rejimê de zelal bibe.

Hin partiyên Kurd li Başûr-Rojava bi salan e dîrekt, an jî îndîrekt bi siyasta PDK, YNK û PKKê ve girêdayî ne. Ev jî astengiyeke pir mezin e, ku partiyên Başûr-Rojava siyaseteke serbixwe derînin holê. Bê guman, ev nayê wê wateyê, ku partî û rêxistinên Kurdan şîretan nedin hevdu û alîkariya hevdu nekin. Nexêr, divêt her partî û rêxistin li gorî rewşa perçê ku ew têde ne serbixwe bin, ku bikaribin li gor rewşa xwe siyasetê bikin. Wekî din ne fêyde ye ji bo tevgera wî perçî, ku partiyên perçên din xwe wek serekên partiyên perçeyekî din bihesibînin.

Ya sitar! Niha ev çi mantiq e, ku di çalakiyên ji bo qetilkirina Şêx Mihemed Meeşuq el-Xeznewî de li Qamişlo û derên din silogan ji bo Abdullah Öcalan tên avêtin. Ev mantiq mantiqekî pûç nîne çi ye?

Eger partî û rêxistinên Başûr-Rojava dixwezin di vê pêvajoya nû de li Rojhilata Navîn ser bikevin, divêt berî her tiştî yekîtiyeke xurt ji nav xwe derînin û stratejiyeke nû ji bo xwe amade bikin, da ku Amerîka û Ewropa pê baweriya xwe bînin. Tenê bi çalakiyan, niyet, daxwaz û gotinan nabe, ku mirov bêje: De Amerîka û Ewropa werin alîkariya me bikin, rejimê hilbiweşînîn. Pirsa herî girîng ew e, ku partiyên Kurd di pê hilweşandina rêjîma Sûriyê ya faşît re ji desthilatiyê re amade ne, an na?. Ji bo desthilatiyê çi haziriyên wan hene?

Eger partiyên Kurd bizanibin û bikaribin van bûyeran baş analîz bikin, rêjîma Sûriyê li ber mirinê ye. Lê heta Amerîka bawer neke, ku Kurd li Sûriyê bi quwet in, ti tişt nayê guhertin.

Ez di wê baweriyê de me, ku hêza Kurdên Başûr-Rojava ne hêzeke biçûk e, lê li ser hev nînin. Ger mirov qiyasekê di warê rewşenbîriyê de li ser Bakur û Başûr-Rojava bike, rewşenbîrên Başûr-Rojava ji rewşenbîrên Bakur pir pêşdetir in. Divêt ew berî her tiştî ji xwe bawer bin.

Û Başûr-Rojava dikare bi mixalefeta Libnanê re jî îtifaqan çê bike û ji mixalefeta ku dê di demên pêş de li Liblanê bibe desthilatdar îstîfade bike.

Bi Taybetî
Çima Şêx Meşûq El-Xeznewî...!?

Ferha Yûsif

Pêşgotin: Demê dewletên serdest û dagirker kesayetiyek, naskirî, rêber û jîr şehîd dikin, car cara rondikên timsahan dibarînin, cilên reş li xwe dikin û bi wî û wê cendikî re dimeşin.

Bûyera şehîd kirina Şêx Meşoq Xeznewî bi vî rengî ye. Dewleta Suriyê dixwaze vê bûyerê wek nakokiyên nav malbatê û wek kuştinek asayî ji aliyê çend kesan ve bike, roj̀eva raya gişt̂i, anku dixwaza vê rûreşiya xwe bincil bike, lê di welatê Suriyê ji bîrkiriye ku berî şehîda kirina Şêx bi çend heyvan Şêx tehdîd kiriye û jêra gotine:(te xeta sor derbas kiriye! Tu kurdan şiyar dikê û li ser dûvê xwe rûne...).

1- Şêx Meşoq Xeznewî kî ye?

Navê wî Mihemed Meşoq Xeznewî ye, ew kurê Şêx Izidîn Xeznewî ê zana û jîr, Şêx Meşoq Xeznewî li roj̀a 25/kanûna/1958 an li gundê Tilmerof ku ji girêdayî baj̀arê Qamişloye, tê dinyayê, ew ji malbatek welat parêze ku ji Şêxên terîqa neqişbendî ne. malbata xwe gelekî naskirîne û bi nav û dengê wan belav bûye.

Şêx Meşoq Xeznewî xwendina xwe ya seratayî li gund û herêmê dixwîne, lê ji bo xwendina bilind berê xwe dide baj̀arê Helebê, û di sala 1987'an de diçe welatê Erebistana Sudiyê xwendina xwe dibe serî. Di sala2001ê de jî li welatê Libnanê bawername Masterê werdigre. Dîsan li welatê Pakistanê diktora li ser şarîa û îslamiyetê diqedîne.

2- Kesayetiya wî:

Şêx Meşoq xeznewî pir naskir bû û xwedî têkiliyên berfireh bû. Di warê islamî de reformxwazekî li pêş bû, dixwest îslamê li gorî sedsala 21ê nû bike. Pir bi ax, gel xwe ve girêdayî bû. Di hemû axaftinên wî de diyar bû ku welatê xwe serbixwe û azadiyê bibîne.

3- Çima Şehîd kirin?

Şêx Meşoqê xeznewî di 21ê gulanê de, ji firokxana şamê tê revandin, wî dibin baĵarê Helebê û piştî wî Şehîd dikin, cendikê wî dibin baĵarê Dêrizorê. Armanca şehîd kirina Şêx ew ku ewe bi rastî jî keseyetiyek bi bandor bû. Li ser gel, her gotineke wî, kurdên roĵava ber bi girêdana axê ve dibir, wî rastiya îslam û muslimantiyê ji gel re destnîşan dikir. Wî ji hikmeta Suriyê guhertin dixwestin û doza mafê kurdên roĵava dikir û xewna wî hêviya wî Kurdistanek serbixwe bibîne. Her wesa rûreşiya dewleta Suriyê li welatên Ewropa jî eşkere dikir.

4- Sedemê Veşartina Cendikê wî li Dêrezorê Çi ye?

Veşartina cendikê şêx li baĵarê Dêrezorê pir bi wate û balkêşe. Lewre baĵarê Dêrezorê nawenda Sedamiyane û xelkên vî baĵarî gelekî ji Sedam hez dikin, li gorî nêrîna min ev tolhildaneke li hemberî kurdên roĵava û li hemberî bûyera Qamişlo, di aliyekî din ve dixwazin faşizmê û kurdan bînin beramber hev, lê bûyera şehîdkieina Şêx bi serê xwe faşitiye û xwedî derketina gelê kurd li rêberê xwe vale derxistina siyaseta beasêtiyê ye.

Dawî:

Di dawiyê de dixwazim bibêjim pêwîste kes vê gotina Şêx (ew jî weke netewên dî xwedî dozin, xwedî mafin, divê her kes ji bo vî mafî kar bike) ji bîr nekê. Lewre, bi taybetî şehîd kirina Şêx Meşoq Xeznewî di vir de veşartiye.

Gotara berêz Selah bedirediîn Li heftîya rewşenbîrîya netewîy

23-30/4/2005-Hewlêr

Bêgoman ev hefteya rewşenbîrî ku îro em lidar dexen lebin edrêsa jîyana neteweyî le Kurdistan.

Mebesta me bi jîyana neteweyî li her çiwarparçey Kurdistan ew e ku rewşa kiltura kurdî yan jî rewşenbîrîya kurdî leher çiwarparçeye gihaye çi radeyî çi bûye çi gav hatine avêtin helbet ne ew tenê bêguman ve nîne em zanibin çend pertûk çapûne yan çend rojname derçûne. Erikî reşenbîrîyan ew e ku lê bikolin aya naverok çî ye ev qonaxe ku îro em pêvene ew tiştî ku bibûna diguncê yan ne çi tê xwestin armanca vê hefteya reşenbîrî ew e ku em lê bikollin.

Ku em bigihin hin rastî ku hene ku em bigihin hin dîyarikirina armancê rewşenbîrê kurd çî ye divê qonaxa hande. Taybet ku em di yada (107) salîya rojname vanîya kurdî uw livan nêzîka jî serokî herêmî Kurdistan ê bi resmî ête danan. Bêgoman cejneke gelek pîroze û em divê yadê di vê heftîyame zindû bikin. Tiştê serekî ku li her çiwarparça îro em leberçava ew gavê ku hatine avêtin li Kurdistanî başûr bêguman îro Kurdistana başûr xelekeke esasî bingehî ye bo hemî tevgera neteweyî uw ew pênigavên ku li vir hatine avêtin tiştekî gelek pîrozin anku di çend salekî de bihayê pêncî sala gavên rewşenbîrî hatine avêtin dibê ew tişt berçavê mebin lê bêguman divê em bi pirsin jî aya gelek tişt bûne aya bi program bûne bi dîraset bûne aya pêwîsitî hebûn ew tiştê bûne bibin yan jî hin jiwan ê wê qonaxa ku Kurdistana îraq têde ye, qonaxe veguhestinê ye di navbera şoreş û keyane aya gotara rewşenbîrî yan jîgotara

sîyasî çewa dê xwastên rewşenbîrê kurd îro erikê wane ku vê gotara dîyar bikin. Ku sîyasetmedarek ronî bikin ê gotara sîyasî çi bê. Durşmê sîyasî seqfî rewşenbîrî ê çi bê ew rol ê çewa bête nasîn perwerdekirina cîlê taze di bindesitîya hikumetêda ku îro cara yekeme divê demahada hikumetek ser binîyatê fediralî birengeke taybet, aya gotara rewşenbîrî çewa bête avêtin îro miletê kurd di qonaxeke nû de ye bigişfî li her çar parça mesela çarenûs îro li gorepanêye aya rewşenbîrî kurd her divê em bimênin weku caran di gotara qonaxêda bimênin. Yan jî jime tê xwestin em ji bwî sîyasetmedarê kurd bo tevgera sîyasî kurdî hinek ronî hinek program hinek proje danin meydanê. Lêre mebesta me jî ji vê heftyê bi rastî ne em bêjin wela ev qas rojname le Kurdistana başûr derçûyne yan le estenbûlê ev qas kitêb çap bune. Ev raste divê bêgutin lê divin naverokawêjî bê dîtin aya karê bidê dîyarikirin qonaxa kurdê delal yan jî îro ev qonaxe ku em gihane vê qonaxa cîhangêrî û enterinêt û aya gotara me divê çi bê weku rewşenbîrî kurd û emê çewa cîlê taze perwerde bikin. Bi çi rengî emê lihe miber ew zimanênin zîndû neteweyî wixort, emê çewa liber wê rawestin emê çewa heya li ber zimanê erebî, turikî û farisî, rawestin li ber kiltora hersê mileta ji ber kiltora me bindest bû lawaz bû zulim lêkiribû nikarîbû dengê xwe beriz bikê lê îro dema nav neteweyî ku em pêvene dema tazeye, aya rewşenbîrê kurd li gor wê demê ne yan ne îro ev jime tê xwestin erikê me eve bi rastî divê şoreşek rewşenbîrî çêbibê divîç lêkolîneke gelek rexnegir le hemî tiştê ku îro hene bibê.

Bi taybetî ev erikê ha liser şanê Kurdistana başûr e bêhtir jiber îro sentera neteweyî ye îro tê xwestên jê, bi erastî ji hemî rewşenbîrên parçê Kurdistanê bi taybetî ewên ku li der vey ûlatin z nabêjim ba li parçê Kurdistanê yên dîtir rewşenbîr û zana û şareza bêne vir dibêjim ewên li der vey welatin. Ew li welatê bêgane kar dikin îro pêm waye hikumeta herêm rêga daye ev şareza û zana û rewşenbîr karin bên li vir erikaxwe bibênin rola xwe bibênin. Uw pirojê rewşenbîrî bi pêş

ve bibin îro firset heye bîyav heye ya dîtir mesela ziman û zarav, ev tiştekî gelek giring e ta êsta di bawerîya medae pûyte wa pê nebûye di rêya korê zanîyarî tiştek nebû me tiştek nedît be rastî, ev çend sale bi rastî jî biburin hendek dibêjin korî zanîyarî nîne ê baş e em çi bikin baş e ne divê em li yek û du bigihin em mîletekin weku cenabî wezîr gut anku rewşenbîrî me digihênê ev pirsa rewşenbîrî, zimane, dîroke û kiltore îro em gelek di hev nakihin em tiştê hev naxwênin anku zimanê kurmancî û soranî û zazakî ev îro bi rastî pirsek e gelek gewireye ev wextê îro mesela çarenûsî bête gurepanê ev merce hel nebê pêm waye mesela çarenûsî lêye. Di bawerîya meda ji ber yek mercê mesela dewllet yan jî kîyan yan jî miletek serxwe bibê mesela zimane zimanê yek û du, yek ziman ew jî îro tê xwestin.

Îro liKurdistana îêraqê pirsa fediralîzmê îro bicih bûye yan jî bi rê ve ye ku bicih bibê. Bêguman wek nimûne fediralîyetke taybete. Ew fediralî ye ku me di dîrokêde xwendine ya li hin welatên tir pêk hatî ye fediralîya Kurdistan ne weku wê ye. Tiştekî taybetmendî wê hene uw îro dised salîya bîst û yekî de fediralîya miletek, sedsalîya xebat deka li gor wê rewştî fediralîyetek pêk hatî ye. Aya rewşnbîrî kurd çi dibêjê ser wê fediraliyê nedivê lêkolîn çê bibê. Ne divê zelal bibê heta qanûnî û maf nas û ev tê xwestin ji rewşe nibîra, zelal bikin. Nemerce ku ew fediralîya berî pêncî salî li welatekî ewrobî ya emirîka latînî yan jî asîyewî çêbûbê kopî li Kurdistan çêbibêê wekî çewa cenabî serokî hikumetê da dîyarî kirin. Di wextekîde gotî ew peywendîmey sîyasî ku hene yan jî ê dîblomasî ê weku xwe bimênin. Ew fediraliyê ku licîhanê hene peywendiyê der ve nîne îro taybetmendîyek heye fediraliyê kulcîhanê çêbûne çi serok nîne.

Îro li Kurdistanê pêk bênin. Ême li ser şanî me hemûyane bi rastî ku em lêkolîneweyek xurt bikin. Rewşenbîrê kurd li ser vê meselê rawestin em tiştekî dibin pêş gelek mixabin rewşenbîrê me bêhtir dikarê rojaneda meşxul û mijûlin di karê îdarîdae ev tiştekî gelek kême, çî ye ez hêvî dikem ev tişt

lêkolînên rexne girî dişên bidin berçav betaybetî dezgay rageyandin ku rolekî wî gewire heye eger dengê rewşenbîrekî hebê, zana û şarezabê, eger rageyandin bilav nekê çi bihayê wî nîne. Li ber wa îro em hemî dibêjin û em bawerîya din weku welat parêz weku însan neteweyî em dibênin îro ew firseta li Kurdistana îêraqê çêbûye divê serikevê divê zexim bibê divê bibê yêdin ême ji erikê me hemîyane mesele neçekdarî ye. Ne mesela welle emê sed pêşimerge binêrin boxebat îro şerê rewşenbîrî ye her wekî serikoma sîyasîya Kurdistana îraq berî pişfî şerr çê bû îraq azad bû dîyar kirin gotin şerrî dibilomasî û sîyasî û dest pê kir, şerê sîyasî dest pê kir ev şerrê sîyasî îro canbê nîwey esasî bingehî mesela rewşenbîrî ye mesela ew rewşenbîrê kurdin ku îro herîyek pisporîya wî heye herîyek di warekî de karê huner xwe nîşan bida. Ême divê heftîyahada emê hewil bidîn ku ev mêvanên berêz ku îro ji her çiwarparçey Kurdistan beşdar bûyine wek çewa diprogram da hatî ye dîyarî kin emê hewil bidîn em bizanibin her parçek gihaye çe pileyê di mesela rewşenbîrî û çi jê tê xwestin û dawî dawî nîvşkê wê, erik çine giringî çî ye bo rojê tê ev îro jime tê xwestin ev dibê weku program helbet ew tiştê divê heftyê tê, dibê ne her tişte belê pênigaveke, gaveke eger hinek jiblî me jî bikin hin dezgehên dîtir bikin. Dibê hemî bi hevre yektir te Mam bikin emê bigihin hinek rastîya ew rastyê ku rojên bên salên bên li ser rohinîya wî karî xwe bibin serî bi erastî tê xwestin ji wan rewşenbîrên hêja ku ê peşdarî vê heftyê bibin dîyar bikin anku asoy rojên tê çî ye.

Bo rewşenbîrî kurd bo dahatyê kurd çî ye di meseley rewşenbîrî ziman weku miletek bête dîyarî kirin bêhtir îro ev şensê meyî baş e ku îro gelê kurd hev qas sall anku direng bû azadîya wî îro ev tiştê çê bû berastî tevgera kurd li vir di gotara sîyasî bûye nimûne li herêma rojihelata naverast û li cîhanê anku bi rengekê nefesek dîmuqratî nefesek mafên mirov nefesek anku rêzilê girtin le komellgay medenî ev serpêhatîya ku liKurdistana îraq dibê.

Ew kêmasyê ku hene jî divê em gurtir bikin xurt tir bikin. Em vê ser pêhatîya Kurdistana îraq bikin nimûnek nav neteweyî ku îro em hemî dizanin serê me bilinde ew tiştê li bexda dibê li Selahedîn çê nabê ev tiştekî gelek giring e bo me, hikumet wextê li bexda asteng çê dibê hêzên gewire tên îstşarey serikirdayetîya mey sîyasî li vir dekin ev cêgay ser bilindayî ye, divê rewşenbîrê me vî tiştê bidin berçav.

Divê vî tiştî tefsîr bikin ême di rewşekê dene belkî kurda gelek ezîyet dît. Gelek kuştin gelek karesat lê ez bawer dikim ew direng bûna kuçê bû feyde da eqlê kurdî fayde da sîyasetmedarê kurd ku gelek tecrîbe û serpêhatî wergirtin lê îro lê îro pisîyar li vir de ye aya rewşenbîr dibê gotara komellga yan gotara sîyasî dîyar bikin yan jî liser şanî sîyasî de ye. Di bawerîya me ev erikê rewşenbîraye ji ber qonax wê dixwazê ne ew qonax şerêsare ne ew qonaxe ku ji bo xatirê meselene şorşgêrî her tişt ê nehênî bê îro her tişt aşikiraye şefafîyet heye rewşnbîr huceta wan nemaye îro meydanî dibê spat bikin rola wa çî ye, emê hewil bikin divê heftyê de hinek rastî dîyar bikin.

Em bigihin hinek netîce ew jî hêvîya min gelek heye ew mêvanên ezîz ku ji Kurdistana êran û turikîya û surîya û ew Mamostay ezîzê li Kurdistana îraq beşdarbin hêvîya me heye ku em karibin bigihin hem xulasey ku îstifade taybetî têda hebê ji bûy hem tevgera rewşenbîrî hem tevgera sîyasî bêguman ew tiştê ku li vir bibê ew tiştê ku bê gotin hemî bibê weku Namîlkeyekî yan jî weku nîv kitêbek emê çap bikin emê gelek jî bixurtî û firehî belavbken heta di warê enterinêt de em hêvî darin jî ew bira û Mamosta ku îro hatîne wa rojê bên ew ku tim kor hebin em hêvî dikin beşdarîyekî xurt çê bikin ji ber nebitenê ew kesey ku tê hijmartin rewşenbîr bîr libîr û bawerîya xwe divêt dibê danûstandin bibê dibê mudaxle bibê. Em hêvî darin ku ev heftîya ha zengîn bê bi amadebûna rewşenbîrê hewlêr ku em gelek keyif xweşin bihatina wan û gelek spas gelek bi xêr hatin.